



## ŞÎRETNAMEYA LÊPIRSÎNA PENABERİYÊ

Tu hafî gazîkirin bo lêpirsîna penaberiye li Daîreya Koçberan. Ev sîret behsa maf û peywirên te di lêpirsînê de dike. Wê li gel nûnera/ê xwe bas bixwîne. Eger pirsên te hebin, ji nûnera/ê xwe yan di lêpirsînê de ji karmendê Daîreya Koçberan bipirse.

### Mebesta lêpirsînê çi ye?

- Te dawa penaberiye li Fîrlandayê kiriye. Di lêpirsînê de dê wan sebebên ji te bipirsîn ka tu çima dawa penaberiye ji Fîrlandayê dijî û çima nikaî vegeî welatê xwe.
- Giring e ku tu hemû sebebên dawaya xwe di vê lêpirsînê de bibêjî. Eger hinek sebebên din pişî vê lêpirsînê peyda bibin yan bixwazî li ser sebebên pêştir agahiyên nû bidî, di zûtirîn demê de Daîreya Koçberan yan dadgeha birêvebera dawaya te haydar bike.

## Di lêpîrsînê de çi mafên te hene?

- Nûnera/ê te li gel te tê lêpîrsînê.
- Te maf heye ku parêzer jî li gel xwe bînî lêpîrsînê.
- Di lêpîrsînê de terciman heye ku bi zimanê te dipeyive. Karê terciman ew e ku her tiştê gofî bi bêalîfî wergerîne. Terciman dikare li wî cihî be yan jî li ser telefonê yan vîdyoyê be.
- Lêpîrsker, terciman û parêzer xwedî wezîfeya parastina surran in anku nabe ew tiştên di lêpîrsînê de bihîstî bo kesên din aşkere bikin, heta bo endamên malbata te jî. Belgenamêyan li ser doza te bi surrî tên parastin.
- Daîreya Koçberan dikare hewl bide serperîştên te yê eslî bibîne. Mebest ji serperîştên eslî ew kes in ku li welatê te tu xwedî dikirî. Bo dîtinê tenê agahiyên zerûrî tên bikaranîn. Daîreya Koçberan hewla dîtinê wisa dide ku zîyan yan zerer negihin te yan mirovên te.

## Di lêpîrsînê de çi berpirsiyarên te hene?

- Berpirsiyariya te ye ku behsa wan halet û sebebên bikî ku çima dawa penaberiyê dikî. Behsa hemû sebebên heyî di lêpîrsînê de bike.
- Bo te baş e ku herwiha behsa pîrsgirêkên dijwar jî bikî. Mumkin e ku ew çaresaz bin li ser biryara ku bidin te.
- Rast bibêje. Eger tiştêkî nizanî yan neyê bîra te, hewl nede ku bersivêkê ji bal xwe ve çêkî. Bibêje ez nizanim yan nayê bîra min. Dayîna agahiyên nerast dikare bibe sebebê bawernekirina ji dawa te.
- Di lêpîrsînê de nav û dema jidayikbûna xwe rast bibêje. Eger bixwazî dîvre agahiyên nasnameya xwe tenê bi belgenamêyan resmî yê hikûmî biguherî.
- (Yên zêdetir ji 15 salî) Dayîna agahiyên nerast yê nasnameyî tawanek e ku tê cezakirin.
- Bizane ku dayîna agahiyên nerast yan veşartina agahiyên rast dikare bibe sebebê wê yekê ku îqameya dayî te ji te bistînin yan birêvebirina dawa te aloztir bibe.

## Çawa xwe bo lêpîrsînê hazir bikî baş e?

- Berî lêpîrsînê hemû şîretên karbidestan dayî te li gel nûnera/ê xwe bixwîne.
- Eger bixwazî terciman jin an mêr be, berî roja lêpîrsînê bibêje nûnera/ê xwe yan karmendekî kampa xwe. Ew hêviya te bigihîne Daîreya Koçberan.

- Eger halê te yê laşî yan ruhî wisa be ku tesîrê li ser lêpirsînê bike, bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dikare bi izna te berî lêpirsînê wê bibêje Daîreya Koçberan.
- Kamp dê te wisa bişîne ku bigihî cihê lêpirsînê. Li gel rêberan berî roja lêpirsînê li ser hatinê bipeyivin.
- Xwarinê yan pare bo firavînê ji kampê bixwaze û li gel xwe bîne.
- Dermanê bi rojê bo te lazim bin li gel xwe bîne.
- Hemû wan belgename û îsbatan li gel xwe bîne ku têkilî dawa te ne.

## **Roja lêpirsînê li Daîreya Koçberan wiha bike**

- Tu dê nûner û parêzerê xwe li Daîreya Koçberan bibînî.
- Gava tu tê avahiyê Daîreya Koçberan, dikarin teffîşê li te bikin.
- Karta xwe ya kampê nîşanî dergehvanê Daîreya Koçberan bide.
- Tenê kesên gazîkirî dikarin bên avahiyê Daîreya Koçberan û kesên ku biryar li ser hatina wan li gel te hatiye dan.
- Eger bixwazî alîkarek li gel te bê, ew dikare pêştir bi nivîskî ji Daîreya Koçberan daxwaz bike. Wek din lêpirsker biryarê dide ka alîkar dikare beşdar bibe yan na. Alîkar ne parêzer e û beşdarî ronkirina meseleyê nabe.
- Lêpirsker karmendekî Daîreya Koçberan e.
- Lêpirsker dê li salona çavdêriyê gazî te, nûner û parêzerê te bike.
- Dengê lêpirsînê tê qeydkirin. Li odeyê herwiha kameraya çavdêriyê ya qeydker heye.
- Lêpirsîn hemû rojê vedikêşe. Di navberê de bêhnvedana firavîn xwarinê û hinek bêhnvedanên din hene. Tu dikarî herdem dawa bêhnvedanê bikî.
- Eger hewce be, dikarin rojê din lêpirsînê bidomînin. Hingê dê careke din gaziyek bo te bê.

## **Di lêpirsînê de çi dibe?**

- Destpêkê lêpirsker dibêje ka di lêpirsînê de çi dibe û piştrast dike ku tu maf û peywirên xwe fehm dikî. Bipirse eger tiştêkî fehm nekî. Bibêje eger ji terciman fehm nekî.
- Eger pêştir bi dûrûdirêjî li ser nasnameya te nehatibe pirsîn, lêpirsker wan pirsan dike. Ew dipirse ka malbata te kî ne, tu li kû derê jiyayî û bi çi rê hatî Finlandayê.

- Pişî hingê dipirse tu çima ji welatê xwe reviyayî û çima nikarî vegeî. Tiştên ku bi serê te hatine bi rastgoyî behs bike û heta mumkin be bi hûrgilî.
- Lêpirsker çend pirsên deqîqker derbarê wan wan tiştan dipirse ku behs dikî. I rastgoyî bersivê bide. Bibêje eger tu nizanî yan nayê bîra te.
- Hinek pirsên giştî ji hemû penaxwazan tên kirin. Lêpirsker herwiha dipirse ka raya te li ser derkirina ji welatî û qedexekirina vegeîne çî ye.
- Nûner an parêzer nabe ku li ser navê te bersivan bide. Ew dikarin di dema lêpîrsînê de te şîret bikin û bînin bîra te ku divê tu behsa tiştên girîng bikî.
- Lêpirsker li ser kompûterê dinivîse wan tiştên ku di lêpîrsînê de tên axiftin. Navê wan têbîniyan bîrname ye. Dawiyê terciman dê bo te wê bîrnameyê bixwîne ku lêpirskerî nivîsiye. Eger xelefî tê de hebin, divê ku tu bibêji lêpirskerî. Tu dikarî herwiha tiştan lê zêde bikî. Pişî wê bîrname tê îmzakirin û kopyekê jê didin nûnera/ê te.

## Daîreya Koçberan çawa biryarê dide?

- Li ser dawa te mumkin e ku mafê penaberîya navneteweyî yan îqameyê ji ber sebebên insanî yan ji ber qurbaniya bazirganiya bi mirovan bidin te.
- Daîreya Koçberan biryarê li ser agahiyên te di lêpîrsîna penaberîyê de dayî û belgeyên din yê pêşkêşkirî dide.
- Eger hewce be, Daîreya Koçberan dikare lêkolînê li ser orijînaliya belgeyên te dayî bike. Karbidestên welatê te ti agahiyê ji wan wernagirin û ew lêkolîn nabin sebebê xeteriyê li ser te yan mirovên te.
- Eger paşî bixwazî zêdetir agahî yan belgeyan pêşkêş bikî, bi nivîskî bişîne. Em li ser telefonê behsa mesela te nakin, çunkî em nikarin piştrast bin ka telefonker kî ye.
- Eger dawa te bêt redkirin, dikarin te vegeînin û hatina bo Fîrlandayê û welatên din yê hevpeymanên Schengenê li te qedexe bikin.
- Eger te sebebekî nû bi dawakirina penaberîyê hebe pişî ku biryara Daîreya Koçber li ser dawanameya te bigihe hukmê qanûnê, di zûtirîn demê de dawayeke nû bike. Divê ku sebebekî maqûl hebe ku çima te berê behsa wan sebebên nû nekiriye. Sebeb divê tiştekî wisa be ku ne di bin tesîra te bi xwe de be. Pişî hingê Daîreya Koçberan dê lê binêre ya dawaya te qebûl bike yan na.